

DI EDEBIYATÊ DE KANON Û
FONKSIYONA EDEBIYATÊ

■ LOKMAN POLAT [04]

KILAMEK JI BO BEKO KILAMA
MIROVÊN JIBÎRBÛYÎ

■ DILAZAD ART [39]

Ji bo zarokan
LÎSTIK

■ EMRE MÛHARGÎNÎ [53]



ÇANDNAME

E-KOVARA ÇANDA KURDÎ YA MALPERA WWW.CANDNAME.COMÊ • JIMAR 3 • 09/2020 •

LI PEY ŞOPA BAV Û KALAN
BI RENG Û DENGÊN JÎYANÊ



BI SILAVÊN GERM

JI EDÎTORYAYÊ

ÇANDNAME

e-kovara çanda kurdî
ya malpera www.candname.comê
jimar 3 • 09/2020

Xwedî û Berpirs

Firat Bawerî

Edîtorya

Paşa Amedî
Ridwan Xelîl

Bergsazî û Rûpelsazî

GrafîKURD

Wêneyê Bergê

Murat Adiyaman

Navnîşan

[/www.candname.com](http://www.candname.com)

/candname1@gmail.com

/candnamekovar@gmail.com

[/candnamemalper](https://www.facebook.com/candnamemalper)

[/candnameCom](https://www.youtube.com/candnameCom)

[/candnameTV](https://www.youtube.com/candnameTV)

Nivîskar ji nivîsên xwe,
Xwendevan ji xwendina xwe berpirs in.
Lijneya kovarê li ser nivîsan dikare
serastkirin û guherînan bike.
Her nivîsa ku hatiye şandin
dibê ku newê weşandin.

Xwendevanên hêja û birûmet;

Ziman, stûna jiyane ye...

Ziman, nîşana şarezaiyê ye..

Ziman, hêz û palpišta pêşketinê ye...

Civakên ku zimanê xwe yê çanda modern avanekiribin di dîroka mirovahiye de wek şaxekî qels dimînin an hildiweşin. Çand kurahiya mêtî û ramanên civakê ye... Her civak li gor kurahiya çanda xwe bi bandor e... Ew çand çi çanda civakî çi jî ya fennî-teknîkî be.

Em wek dildarên Çandnameyê bi van armancan ketin rêyekê û ev 5 salin bi malpera www.candname.comê, eKovara Çandnameyê û eWeşanên Çandnameyê xebatên xwe dimeşînin. Heviya me ew e ku em bi hemû çandên modern û yên klasîk zimanê xwe temsîl bikin. Di kovara çandnameyê de nivîsên her cureyên çandê tên weşandin. Çi çandên civakî û çi jî yên teknîkî.

Li gor me teknîk bi tena serê xwe kerr, kor û lal e. Çanda civakî jê re dibe guh, çav û ziman. Dîsa li gor me çanda civakî bi tena serê xwe paşdemayîne, teasube û bêhişiyê. Çandên teknîkî jê re dibin pêşdebirin, lêkolîn û hiş... Her çand bi şaxekî xwe ve bi teknîkekê ve giredayî ye. Bi tena serê xwe şaxeke teknîkî têra mirovahiye nakê. Bi me hemû şaxên çandê alîkarê hevin. Em wan ji hev cuda nabînin. Bi ve armancê deriye me ji her curê nivîsan re vekiriyê.

Çima Çandname?

Ji bo ku çanda me nekêvê destê heramzadêyan. Ji bo ku rûmeta çanda me nekevê binpiya. Ji bo ku çanda xwe nas bikin. Ji bo ku em dixwazin civakeke raman azad avabibê. Ji bo ku jiyaneke bi rûmet bijîn.

Çima e-kovar?

Ji bo ku em di dema teknolojiyê de ne, dem dema ragihandinê ye. Ji ber ku her kes her dem nîkarê kovarên çapkirî bibîne, bikirê û bixwenê. Ji ber ku belavkirina kovarên çapkirî zahmet e û çapkirin bimesref e. Ji bo ku niyeta me ji bo mirovahiye xizmet e û em xwe bi pêş de bibin. Ji bo ku em xwe nas bikin û alaya zimanê xwe li serê çiyayên gerdûnê bilind bikin. Ji bo ku li ku derê, di kîjan dem û di çi şertî de be kes karibin xwe bi gihênin nivîsên çanda kurdî.

Bi heviya hezar hejmaran...

Edîtoryaya Çandnameyê

NEVEROK



04

DI EDEBIYATÊ DE KANON Û
FONKSİYONA EDEBIYATÊ

LOKMAN POLAT



10

VEQETANDINA PÊŞÎN

FAIK ÖCAL



13

QALAQÛÇIK Û LEGLEG

PAŞA AMEDÎ



15

TOMORAFIYA BERHEVKARÎ YA
MÎKROYÊ

SERHAT AYDIN



21

LI CÎHANÊ
PERWERDEHIYA TAYBET


MUSTAFA RÊZAN



26

ALERJÎ

DR.RODÎ ZANYAR



33

KILAMEK JI BO BEKO

DILAZAD ART



44

JIYANA GUNDAN

RECEP ÇIÇEK



47

PIRA MALABADÊ Û DEWLATA
KURD A MERWANÎ

XERZÎ XERZAN



49

JI BO ZAROKAN LÎSTIK

WERGER: EMRE MÛHARGÎNÎ



53

ZIMAN Û JIYAN

BAWER AGIRÎ



55

ZIMANÊ KURDÎ

MUSTAFA ACAR



DI EDEBIYATÊ DE KANON Û FONKSIYONA EDEBIYATÊ

LOKMAN POLAT

Du merhaleyên bingehîn ya edebiyata netewî heye. Yek jê edebiyata klasîk e, ya din jî pêkanîna edebiyata modern/nûjen e. Gotin beriya nivîsê tê. Serkaniya edebiyata kurdî, edebiyata devkî ya gelêrî ye. Nivîskarên edebiyata devkî dengbêj, çîrokbêj û pîrejinên kurd in. Lêkolînavan Edward Saîd dibêje : “Berhemên edebiyata devkî di tasavvura nasnameya netewî de xalekî girîng e.” (Binêr pirtûka Edwar Saîd “Kultur û Emperyalîzm”). Xwedî li derketina edebiyata devkî, berhevkirina vê edebiyatê û nivîsîna wê, lêkolînên li ser çîrokbêj û dengbêjan, li nasnameya xwe ya gelêrî û netewî xwedî derketin e.

Edebiyata kurdî ya klasîk a nivîskî dewlemend e. Di serî de Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û gelekên din gelek berhemên edebî yên hêja afirandine û ev berhemên wan yên nivîskî bûne bingeh, bûne hîmên edebiyata kurdî ya nivîskî. Di edebiyata kurdî a klasîk de kanon, Mem û Zîna Ahmedê Xanî ye.

Ev berhema hêja û nemir di sedsala 17’an de hatiye nivîsîn û ji bo afirandina edebiyata netewî buye serkanî û destpêka edebiyata kurdî ya netewî. Mem û Zîna Ahmedê Xanî di nav kurdan de, ji bo kurdan buye wek metneke pîroz, berhemeke bi rûmet.

Ji bo netewebûnê tiştên herî bingehîn ziman, çand û edebiyat e. Her netewe divê xwediyê hem edebiyata klasîk hem jî ya modern be.

Nivîskarê lêkolînavan Gregory Jusdanîs di pirtûka xwe ya bi navê “Direngmayîna Modernîzmê” de dibêje : “Kanonên edebiyatê otorîteya hinek metnan pêk tîne. Yên edebî ji yên ne edebî vetiqetîne. Tradîsyoneke mihefeze dike û wê derbasê îro dike. Ji bo pêkanîna nasnameya netewî û ji bo parastina wê dibe alîkar.”

Di edebiyatê de kanon, anku kanonên edebî tevahiya metnên nivîskî yên edebî ne. Qaîde û rêzên edebî, civakî û olî ne. Pirtûkên pîroz yên olî di esasê xwe de metnên edebî ne û destpêka kanonê ne. Pirtûkên olî Zend Avesta, Tevrat -Ahîta Qedîm- Kîtabê Miqades -Încîl -Bîbel- û Qur'an metnên kanon yên qedîm in. Ev metnên kanon ji bo pêkhatina nasnameya dînî-olî- û milletî/netewî bûne bingehe.

Du merhaleyên bingehîn ya edebiyata netewî heye. Yek jê edebiyata klasîk e, ya din jî pêkanîna edebiyata modern/nûjen e. Gotin beriya nivîsê tê. Serkaniya edebiyata kurdî, edebiyata devkî ya gelêrî ye. Nivîskarên edebiyata devkî dengbêj, çîrokbêj û pîrejinên kurd in.

Ev metnên kanon ji bo sînogokê, mizgeftê, dêrê-kilîsê- û ji bo cur cure civakên bawermend bune qaîde û kuralên/rêbazên dînî, axlakî û rastiya heqîqetên olî.

Di edebiyatê de kanon, pêkanîna edebiyata/wêjeya milletî/neteweyî ye. Metnên mekana neteweyî ye. Ziman û otorîteya kanonê bê payan e, qedirbilind e. Dehayên wek Homeros, Dante, Shakespeare, Goethe û ji kurdan jî Ahmedê Xanî, damezrevanên kanonên netewî ne. Di damezrandina dewletên netewî û demokratîk de rola Radyo, Tv, rojnameyan, kovaran û edebiyatê girîng e. Masmedîa û edebiyat di pêkanîna û standartbûna zimanê netewî de jî roleke sereke dilizîn.

Edebiyat ji dema beriya damezrandina dewleta netewî de û ji dema pêkanîna dewleta netewî de, di serûmejiyê civakê de dîmenên xeyalî yên tasavvurê çêdike û di mejî û zihîne wan de dibe îmge, xeyal û îmajaya sazûmanî, dibe rêgayî hestê wan, dibe îmgeya pêkanîna sazûmanê û dewletê.



Di nav pêkanîna dewletên neteweyî -yên li cîhanê- û modernîzm, çand û ziman de têkiliyên berbiçav heye. Çawan ku ji bo dewletek neteweyî pêkanîna pereyên-dirafên- fermî û ji bo parastina dewleta netewî û welêt ordu-artêş- pêwîst e, edebiyateke xurt, masmediayeke xurt jî pêwîst e.

Ji bo netewayetiye tiştên herî bingeh ziman, çand û edebiyat e. Her netewe divê xwediyê hem edebiyata klasîk û hem jî edebiyata modern be. Di edebiyatê de pêkanîna kanonê û wezîfeya wê ew e ku; edebiyateke aîdê milletê pêk bîne. Yanê divê her millet aîdê xwe edebiyata xwe hebe.

Edebiyat di pêkanîna nasname û xwenasîna çandî û netewî de roleke pozîtîf dileyze. Entellektuelên neteweyan ji bo avakirina edebiyata millî hewl didin. Kar û xebat dikin, berhemên edebî yên millî û demokratîk diafirînin.


Haceta avakirina hiş û şîûra netewî ziman û edebiyat e. Ziman û edebiyat ji bo nasnameya millî pêwîstiya bingehîn e. Di pêkhatina miletbûnê de rola navendî dilîze. Ruhê ziman û edebiyatê, şîûra edebî ya millî dibe rih û şîûra milletê.

Edebiyat ji bo neteweyan wisan girînge ku; hem derbasbûna milletê, hem dema ku têde dijî û hem jî dahatuya wî, dema wî ya pêşerojê behs dike, çîroka wê qal dike. Edebiyat ji bo miletan tezahura pêkhatina milletî û gavavêtina roj bi roj ber bi modernîzmê ve çûyîn e.

Modernîzebûyîn bê bingehe nabe. Ew li ser bingeha çand û edebiyata milî tê pêkanîn. Pêkanîna wê bi metodên nû, bi şêweyên nû çêdibe. Di dîroka miletan de, di demên çûyîn de kanonên edebî yên klasîk ji bo pêkanîna netewebûnê û di dema nû de jî kanonên edebî yên modern ji bo modernîzmê rolên sereke leyistine û dilîzîn. Kanonên edebî yên klasîk û yên modern wek helqeyên zencîrê berdewama hevdu ne, hevdu temam dikin. Kanonên edebî ji bo civakan hêviyeke, hêviya jîndarbûna çandî û vejîna ruhê milî û di dema niha de jî ruhê demokratîyê û modernîzmê ye.

Berhemên edebî yên Homeros, Shakespeare, Dante, Ahmedê Xanî, Goethe û hwd. ruhê milletên wan îfade dikin. Nasnameya milletên wan nivîskaran bi wan berhemên wan nivîskaran hatiye rapêçan.

Ev berhemên edebî di nav dema çûyîn de û di nav dema nû de bune pire. Kanonên edebî têkildariya di nav deman de roleke girîng dilîze.





Di nav generationan de xiyerarşiyeye hevgirêdayî pêk tîne. Di van sê sed salên dawîn de, li cîhanê edebiyat buye bingeha pêkanîna çanda millî ya neteweyan.

Di civakan de berdwambuna kategoriyên millî û demokratîk bi saya metnên edebî pêk tê. Metnên edebî ji bo neteweyan sîmge ne, remz in. Ev metnên edebî nemir in, her dem dijîn. Berhema edebî ya Cervantes, “Don Kîşot”, berhema nemir ya Ahmedê Xanî, “Mem û Zîn” piştê sê sed salan hêj jî têne xwendin.

Berhemên edebî yên ku îro ji alî nivîskarên kurd ve têne afirandin, sed sal, du sed sal paşê jî dê bêne xwendin. Xwendevanên dema pêşerojê jî, dê ji xwendina van berhemên edebî haz bigrin. Romanên Mehmed Uzun yên biyografîk, berhemên Hesenê Metê yên derûnî/psîkolojîk, çîrokên Firat Cewerî yên spehîbûnê, bedewbûnê û modern, çîrok û romanên min/Lokman Polat/ yên realîst, simbolîk, îronîk, xeyalî û felsefîk, û herweha romanên gelek nivîskarên kurd, sed sal paşê jî dê bêne xwendin.

Di vê demê de ji bo ku di nav civakê de kategoriya xwendin û nivîsandinê kême, loma jî berhemên edebî yên nivîskarên kurd îro kêmtêne xwendin.

Lê dema civak berbi modernîzmê ve biçe, dema kategoriya xwendin û nivîsînê zêde bibe, prestîja nivîskarên kurd jî dê zêde bibe, bilind bibe.

Miletên ku qîmet û rûmeta nivîskarên xwe bizanibin, rûmeta xwe jî bilind dikin. Pêkanîna misionên millî û demokratîk li ser milên nivîskar û rewşenbîran e. Ji bo ku civak ji wan siûdê werbigre, divê di serî de qîmet û rûmetê bide wan. Kurd divê bi çavên îdeolojîk li nivîskarên xwe nenêrin. Kurdên siyasî yên bi rêxistinî divê li hember nivîskaran bi tolerans bin.

Nivîskar û berhemên wan yên edebî berjewendiyên civakî, netewî û demokratîk temsîl dikin. Entelektuelên miletekî wijdana wî miletî ne. Divê tu miletek li hemberê wijdana xwe bê wijdanî neke. Qîmet û rûmetdayina nivîskaran helwesteke axlakiye û divê bê pêkanîn.



Edebiyat ji bo miletan tezahura pêkhatina miletî û gavavêtina roj bi roj ber bi modernîzmê ve çûyîn e.

VEQETANDINA PÊŞÎN

FAİK ÖCAL

“Vê nivîsê li ser
bergeya ûmrê xwe
dinivîsim”



Kezeba min hêj dişewite,
bêriya şîrê dayîka xwe dikim.
Bi peyva dayîka xwe:
Ketime bextê meraqekê xedar.
Di orta dinê de tenê me.
Bihušta min bi bêhna şîrê dayîka min ve,
li dû min ma.
Nizanim, li pêş min çi heye.
Ez ê têkevim bextê kê, bi destên min textê
kê hilweşe, mala kê xira bibe.
Tim tî dibim, kezeba min dişewite.
Demsal havîn e, li ser vegera demê me,

yanî 21ê Hezîranê 2020an
Lê belê şev çolên bêserûber in;
asîman qûl in, bêjingên ji hevde ketine;
roj çiyayên xewlê ne, erdnîgarên
bênavûnîşan in, xewnên parçe pûrçik in.

Bi xwe nikarim, tim çavên xwe di bin
guliyên dayîka xwe de vedikim.
Bêriya bihušta helbestkaran dikim.
Dinê min bêhtir ditirsine, piştîre însan û
yên din. Bi pisîk û kûçikan, bi kutik û
pitikan, bi kulîlk û çivîkan, bi karik û
berxikan hedûriya xwe tînim.

Dayê, ez xewnê kê me?
Were û bi jînê xwe
min tabîr bike,
min tewil bike,
min ronî bike,
min azad bike,
min efû bike.
Bavo, tu tim
çîroka me bibêje, qet
navberê mede.
Bi peyvên me,
kestiya çîroka me binirxîne.





Guh didim bê, diçim dewranê Adem pêxember.
Bêhtir kezeba min dişewite.
Tim tî me.

Fehm dikime ku ev dinê şûna veqetandine.
Niha bi destên dê û bavê xwe
ez ji şîr hatim birrîn.
Ev li ser bergeya ûmrê min li ser dinê
veqetandina min a pêşîn e.
Dizanim veqetandinên min ê bidomînin.
Di destên min de tizbiyê veqetandinê heye.
Ez ê her dem hebekê biqetînim ji ûmrê xwe.
Tim bêriya şîrê dayîka xwe bikim.
Tim tî bibim.

Tim kezeba min ê bişewite.
Dizanim hemû ûmrê min ê
bibe veqetandinekê dirêj
Ez ê di quncikê jiyana xwe de tim
veqetandinên kin berhev bikim.

QALAQÛÇIK Û LEGLEG

PAŞA AMEDÎ



Welatê ku Qalaquçik li ber bi zivitanê dere û hewa êdî sar dibe. Qalaquçik dibêje “Ez herim welatê germ, ka ji xwe re cihekî nabînim.” Qalaquçik dere dere welatekî lê hê zivistin nû qediyaye û giha hê nû şên bûye dibîne. Dere digere zikê xwe têr dike û kêyf dike, ji xwe re: “Ez herim welatê xwe, xeberê bidim hevalên xwe bila ew jî werin”

Qalaquçik dere welatê xwe, bang hevalên xwe dike û dibêje “Min ji xwe re welatekî dûr diye, li vir hêdî hêdî bihar e, em tev koç bikin herin” Legleg li wan guhdar dike, û dibêje:

- Hûn dikin ji vir herin welatê germ û dûr?
- Erê, dinya ber ve sermaye dihere, em ê tev koçbikin
- Niha li wê derê bihar e û şên e?
- Erê
- Çêre û giya çiqas mezin bûne?
- Wele giya û çêre tê çokên min
- Ku giya ewqas gir bibe baş e

Legleg jî xeberê dide hevalên xwe û dibêje “Welatek heye ew der bihar e, çêre û giya şên bûye. Wa ye qalaquçik koç dikin û derin em jî herin.” Legleg jî tev didin pey wan, bi refên qalaquçikan re derin welatê germ.

Legleg mêze dike ku ev welata hê nû ketiye biharê, her der şên e lê hê giya gir nebûye bi zor giya dikeve nav nikulê wan. Legleg dere cem qalaquçikê jê re:

- Te gotibû ‘Li welatê bihar hatiye; giya û çêre mezin bûye digihîje çoka min,’ te min xapand,
- Çima ez te bixapînim, va ye giha gir bûye
- Te gotibû “giya digihîje çoka min,”
- Ma ez derewa dikim, were em herin ser erd xwe bidin ber giya, bipîvin, qalaquçik difire dere nav giya, dibêje:
- A ji te re va ye giya digihîje çoka min.
- Temam, li gorê te giha tê çîqa te, lê li gor min hê giya bi zor dikeve nav nukulê min,
- Wele min rast gotiye lê te şaş fehm kiriye, ez çi bikim.

Qalaquçik: hehecik, hecîreşik



“

MIN JI XWE RE WELATEKÎ DÛR
DIYE, LI VIR HÊDÎ HÊDÎ BIHAR E,
EM TEV KOÇ BIKIN HERIN

”



TOMOGRAFIYA BERHEVKIRÎ YA MÎKROYÊ

ÎNG: MICRO COMPUTED TOMOGRAPHY (MICRO-CT)
SERHAT AYDIN

Tomografiya berhevkiî ya mîkroyê (micro-CT) amûrek e ku ji aliyê bikaranîna tîrêjên X-ê ve wêneyên 3-rehendî (3R) bi çareseriya/pênasa bilind (high resolution/definition) diafirîne. Ew mîna cîhazek e ku dişibîne cîhaza rontgenê li nexweşxaneyê ku mirov diçe filma laşê xwe dide kişandin. Lê cîhaza micro-CT ji cîhaza nexweşxaneyê pirr biçûktir e lê belê çareseriya wê jî bilindtir e. Di nav teknîkên din ên wênekirinê de, wênekirina micro-CT di pir rewşan de, ne biresera (obje) orîjînal hilweşîne ne jî nimûneyên biyolojîkî zirarê dike.

Amadekirina nimûne, standin, û dirûşandin ne hewce ne. Yek sehkirin (sken kirin, scanning) dikare teviya nimûneyê diyar û xuya bike û wêneyên 3R bi çareseriya bilind ava bike. Ji ber ku bikaranîna wê hêsan e, micro-CT di beşên endezyarî û zanistîyê de yek ji teknîkên karakterîzasyon ên herî hêz e.


Ew ji bo karakterîzasyona avahiya (structure) nimûneyên 3Rê bi taybetî morfolojîya strukturê, geometrî, porozîtî û belavkirina mezinahîya pore yê nimûneyên 3Rê tê bikaranîn.

Bi aliyê veavakirina (reconstruction) pelên wêneyên 2Rê ve, wêneyên 3Rê têne çêkirin.

Ji ber vê yekê, di vê pevajojê de 4 pêngavên esasî yê hêsanî hene. Ew li jêr tèn dan:

1. Hilberandina tîrêjên X-ê

2. Mijandina (Absorption) / Vediguhêza (transmission) tîrêjên X-ê



Fîgûr 1. 3R-modela diranê mirovê bikaranîna micro-CTyê.

3. Çerxandina (rotation) nimûneyê bo çêkirina wêneya 3Rê


4. Veavakirina pelên wêneyên 2Rê

1. Hilberandina tîrêjên X-ê


Tîrêjên X-ê formek ji radyasyona elektromagnetîkî ya enerjîya bilind e. Ew ji aliyê herîka elektrîkê û ango elektronan têne hilberandin. Elektronan di kathotê de, ku elementên tungsten û paxir têne bikaranîn, têne çêkirin.

Tîrêjên X-ê ji aliyê radyasyona van elementan ve têne derketin holê û bi bireserê ve vediguhêzin. Di çavkaniya tîrêjên X-ê de, du cûrên projeksiyonê hene. Di rewşa herî hêsan de, çavkanî dikare wek tîrêjên X-ya paralel were fikirandin (Fîgûr 2).

Heke kesêke dixwaze di pêvajoyên sewirandin û karakterîzasyonê de rola micro-CT fehm bike, ewilî divê bingehên prensîpên wê baş bitêgihîşîne. Di vê ramanê de, her parçeya tîjên paralel ji çavkaniyê tê belav kirin, û ji aliyê nimûneya 3Rê ve tê mijandin, û paşî bi detektorê de vediguhêze.



Fîgûr 1. Rêbaza sehkirina micro-CT bikaranîna çavkaniya tîrêjên paralelê



Fîgûr 2. Prensîpa sehkirina micro-CT bikaranîna çavkaniya tîrêjên konîyê.


Di hundurê nimûneyê de, her xala ku bi tîrêjên X-ê re têkilî dike, tê de agahdariya mijandinê heye. Întegrasyona agahdariya mijandinê ji van teviya xalan alîkarî û beşdariya çebûna wêneya siyê dike.

Lê belê piraniya çavkaniyên tîrêjên X-ê, li şûna tîrêjên parallel, tîrêjên konîyê ku ji xala çavkaniyê derdikeve, bihilberîne (Fîgûr 3). Ji ber ku, belavbûna stûrîtiya nimûneyê ne hevrêk (homojen) e, Her ku dûrahiya di navbera xalên objektê û aksîsa optîkî de zêde dibe, tewandina pelan di pêvajoya veavakirinê de zêde dibe.

2. Mijandina tîrêjen X-ê

Di pêvajoya wênekirina micro-CTê de du heb têgihên giring hene. Ew mijandin û veguhazina tîrêjên X-ê ne ku di bireserê de çêdibe. Carna hin tîrêjên X-ê bi parçeyek carna jî bi tevahî ji aliyê bireserê ve têne mijandin û asta mijandin jî ji materyalê ve giredayî ye. Hinekên din jî bi taybetî yên ku enerjîya wan bilindtir paşî mijandinê (absorpsiyon) digihîje dedektorê û ew jî wek tîrêjên guhaztî (transmitted X-rays) tê binavkirin. Tîrêjên Xê ku ji nimûneyê gihîştîne dedektorê tê de agahî (data) hene.





Dedektor jî wan agahîyan kom û tomar dike bi vî awayî wêneya nimûneyê çêdibe.

Mijandina tîrêjên X-ê bi lawazkirina (attenuation) materyala bireserê ve tê diyar kirin.

Formula wê li jêr e.

$I_1 = I_0 \cdot e^{-\mu t}$

Li vir;

I_0 = Tîrîbûna (intensity) tîrêjên X-ê li têtetanê

I_1 = Tîrîbûna tîrêjên X-ê li jêderanê

μ = Hawkolkeyê (coefficient) lawazkirina tîrêjên X-ê

t = Stûrîtiya materyalê

Ast û mêjera mijandinê bi materyala bireserê (obje) ve giredayî ye. Cûreya materyala nimûneyê tîrêjên X-ê, ku digîhîşîne dedektorê, bandor dike. Bi vî awayî materyalên stûr, wek hestî, tîrêjên X-ê ji materyalên sivik zêdetir dimijînin. Bi gotinên din, materyalên sivik, wek tevnên laşê û -

polîmeran, zêdetir dihelin ku tîrêjên X-ê ji bireserê (ji xwe) derbas bibe.

Ji ber ve yekê, heke materyala bireserê stûr be asta tîrêjên guhaztî kêm dibe, lê heke sivik be bilind dibe.

Her wesa berevajî, heke materyala bireserê stûr be asta mijandina tîrêjên bilind dibe, lê heke sivik be kêm dibe. Ji vir tê fehm kirin ku du têgihên (mijandin (absorpsiyon) û vediguhêza (transmîsyon) tîrêjên) li dijî hev in. Li vir wateyên têgiha materyala stûr an jî materyala sivik bi hejmara atomî ve giredayî ye.

Demek materyala stûr hejmara atomê bilind, ya sivik jî yê kêm destnîşan dide. Mînak, zirinc (qurşun) ji ber ku hejmara atomê wî bilind e, tîrêjen X-ê gelek baş asteng dike û nahêle ku ew derbas bibe. Ji ber ve yekê jî ew, wek materyalê parastinê, li dora amûrên tîrêjên X-ê gelek tê bijartin.

Ji aliyekî din ve, hilberandina wêne gelek zehmet dibe dema ku bikaranîna nimûneya ku hejmara atomê wê kême. Mînak, elementa berîlyum xwedî hejmara atomê kême û lewma jî dibe sedema rêjeya lawazkirina kême. Bi kurtahî, her ku hejmara atomê materyalê bilind dibe, rêjeya lawazkirina kêmtir dibe. Ji ber ve yekê, ew bi hêsanî di wekhevîyê de tê dîtîn ku di rêjeya lawazkirina bilind de (ango ji bo materyalê stûr), tîrîbûna tîrêjen guhaztî kême dibe.

3. Çerxandina nimûneyê ji bo pêkanîna wêneya 3R

Dema ku sehkirin (sken kirin, scanning) dest pê dibe, nimûne ji aliyê çarxandina çimbilê bireserê ve tê zivirandin. Mezinahiya pêngava çimbilê bi gelemperî ji 0.7 dereceyê (nirxa xwerû) biçûktir e. Heya ku qedandina 360 dereceyan, di her pêngava rotasyonê de wêneya projeksiyonê tê kişandin. Her ku mezinahiya pêngava biçûk dibe, hejmarên pelên wêneyê zêdetir dibe û ji ber ve yekê jî ew hem li ser -

kompûterê de gelek cîh digire hem jî demên sehkirin direj dibe.


Ji ber ku kontrasta nimûneyên mezin bilind e, ji bo wan mezinahiya pêngava biçûk çêtir e. Lê heke numûne biçûk be, ji bo kêmkirina wextê sehkirin, bîr û dîska kompûterê, zêdekirina mezinahiya pêngavê çareseriyê bibandor e.

4. Veavakirina Wêneyên Projeksiyonê

Veavakirin bi hêsanî dikare wek pêvajoyên hesabkirina wêneyên projeksiyonê yê ku tê de agahdariya struktura bireserê hebin, were ravekirin.

Di dawiya pêvajoyê de, rêzek wêneyên veavakirinê têne wergirtin. Vê pêvajoyê algorîtmaya veavakirina tîrêjen konîk ku cûreka projeksiyona piştê ya filtrandî (FBP: Filtered Back Projection) ye ve girêdayî ye. Navê vê algorîtmaya Feldkamp, Davis, û Kemp (FDK) e. FBP û FDK algorîtmayên veavakirina analîtîk in. Ji bo veavakirina wêneyan ew metoda esasî ne.





DERBARÊ NIVÎSKAR

SERHAT AYDIN

Di sala 1992an de li bajarê Amedê hat dinê. Dibistana seretayî, navîn û lîseyê li bajarê xwe xwend. Piştî wî hat Stênbole ji bo xwendina zanîngehê. Li vir, lîsansa xwe di beşa endezyariya kîmyayî ya Zanîngeha Teknîkî ya Stenbolê de (@ITU) kir. Paşî, di beşa zanistîya materyalê ya Zanîngeha Sabanciyê de mastira xwe qedand.

Niha, dîsa di zanîngeha sabanciyê de, û di bi heman departmantê de doktora (PhD) û asîstaniya xwe didomîne. Bi kurtayî û hêsaniya teza mastirê bi endazyariya tevna hestî ve girêdayî bû. Ji bilî Kurdî û Tirkî, Îngîlîzî jî dizane û zimanê lêkolîna wî Îngîlîzî ye.

Çavkanî

- ✓ Bruker Instruction Manual, “Desktop X-ray microtomograph”
- ✓ <https://www.microphotonics.com/>, “How does a micro-CT scanner work?” .
- ✓ Wikipedia contributors. (2020, June 3). X-ray microtomography. In Wikipedia, The Free Encyclopedia. Retrieved 21:06, June 16, 2020, from ✓ https://en.wikipedia.org/w/index.php?title=X-ray_microtomography&oldid=960467278
- ✓ M. S. Aydın, “Fabrication and characterization of PCL-nHA composite scaffolds by using non-solvent induced phase separation technique in bone tissue engineering.” 2019.

LI CÎHANÊ

PERWERDEHIYA TAYBET

MUSTAFA RÊZAN

Armanca rêbaza Seguinî ne dûrketina ji civakê, di bingehêke têkiliyên digel hevvelatîyên din bû. Lê belê van rêbazên perwerdeyê encamên lawaz dan û hêviyên mezin li ber xweziyan biçûk dêrand.

Rêberên guherîna civakî ji bo saxkirin û tendirustiya civakê, di destpêka sedsala nozdehan de derketên rê.

Edouard J. Seguin (1812-1880), Samuel Gridley Howe (1801-1876) û Thomas Hopkins Galaudet (1787-1851) û heta gelek bijîşk û mirovên ayînî, xwastin ku îhmalkirina kesên nekanyar û tevgera xeberok a kesên nekanyar li hember wan kêmtir bikin an bi awayeke baş encam bidin. Dîrok aşkere dike di salên 1800î de ji bo van kesên nekanyar; her dem girtîgeh, xwarin û vexwarina bêhijyen û kesayeta bêegzersîz dihate kesibandin. Bi zêdehî sedsala nozdeh û bîstan de pispor, girtîxaneyên wan de mane û li çareya dermankirina rewş û tevgerên wan geriyane. Parêzvanên wan sazîyên di vê baweriyê de bûn ku jariya aborî, niyeta xirab dibû sedema têkiliyên tundiyê li gel wan nekanyaran.

Reformîstên wekî xanima Dorothea Dixê (1802-1887) li ser parzêgehên hikumetê biser ketin.



Xanima Dorothea li Kanadayê bû rêbera van xebatan û heta li başûr jî deng veda. Li DYÂê jî Xanima Dorothea di xebatên başkirina kêmhîşan de bû pêşengek. Ew biser ketin ji bo fonên bêtir û ji bo sazîyên pêştir û mezintir. Ev avahî li ser “kêmhîşî” paşê li ser “kêhfêman” paşê jî li ser “kêmraman” sekinin.

Nexweşiya hiş, dînbûn, dîvane bûn û li ser kerîtî û korîtî sekinin. Zarokên nekanyar yê dadgehkirî dihatin şandin ji bo girtîgeh an sazîyên reformê. Yê dîn dihatin tomarkirin, dişandin nexweşxaneyan. Xanima Dorothea û şopînerên wê di vê baweriyê de bûn ku îhmalkirina van kesên nekanyar dê bi dawî were.



Tedawiya rêwiştî di destpêka sedsala nozdehan de li nexweşxaneyên derûnî(psîkayatrî) de nijde bû û armanc wekî nexweşên serêş û dilêş, tedawiya wan bû. Di tedawiya rêwişt de rê û rêbazên nêzî terapiyên pişeyî yên îro û hînkirina sîstematîkî dihate bikaranîn. Di delîlên vê nêrînê de xwuya dike ku him mirovî him jî bandortir bûye.

Li gelek dewletan di navbera 1960an û 1970an de li zarokên nekanyar xizmet nehate dayîn. Heta gelek welat, van zarokan ji perwerdeyê û civakê dûr xistin. Lê carde jî hinek dewletan bi bernameyên neguncaw xizmet dane. Mînak; zarokên nekanyar ên hişmendî tevî bernameyên ji bo zarokên asan hatine bicîhkirin. Li dû vana pêvajoyê, bi zagonên pêwîst ji bo alîkariya malbat û fînansekirina xizmetguzariya wan, ajot. Bi zagonên lawaz û destpêkî yên federalî, malbat û xizmetguzariya zarokan hatin fînansekirin û dibistanên herêmê hatin peywirdarkirin. Digel van fînansekirin û zagonên pêwîst jî zarokên nekanyar di perwerdeya dibistanan de nekêrhatî û dervê xizmetguzariyê dihatin nîşandan.

Di sedsala bîst û yekemîn de li çarmedorê cîhanê, mafê kesên nekanyar kêmkirî hindik dihê dayîn. Helbet di rabirdûyê de her gel li gor adet û kevneşopiyên xwe li hember tevgeriyayê. Ev tevger, carina pir tûj û ji kokê de mafê van kesên nekanyar bûye. Carina hin gel jî, ew parastine û weke diyariyek bin, li wan xwedî derketine. Bi pêşveçûna teknolojiyê, têkilî ya navnetewî, gel û millet ji hin kevneşopiyên xwe yên tûj vekîşiyane û di warê çand, raman, dîtin, nêrîn û perwerdeyê de ber hev de çûne. Ji van rewşa sedsaliya vê demê yek jî bi perwerdeyê reşen ya navnetewî, perwerdeya kesên nekanyar jî li rojevê cîhê xwe germagerm girtiye. Û bi zagon û makezagonan mafê xwendin û şênayebûn a van kesên nekanyar hatiye pejirandin.

Ti sepanên van zagonên navnetewî, li ser dewletên azad tune ne, lê belê bala dewletan dikişîne ser van zagonan û wan li ser perwerdeyê wekhev a ji ol, çand, ziman, netew û civakaboriyê qetiyayî kom dike. Û bala wan dikişîne ser ji bo her kesî perwerde û perwerdeyê wekhevî.



Madeya 26an a Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan

Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan di 10ê kanûnê de li Lijneya Gelemper a Neteweyên Yekbûyî de hatiye pejirandin. Maf û azadiyên bingeh bi nasîna gerdûnî ya sala 1948an, ji bo her mirovî/ê xwezayî û ji bo her kesî/ê bi pîvana wehkeviyê nîşan dide. Di vî warî de madeya 26an, bi taybet li ser ji bo mirovan gişan mafê perwerdeyê disekine. Mafê xwendinê yê her kesî/ê heye. Perwerdeyî kêmtirîn di asta seretayî û navîn de divê bêpere be. Perwerdeya seretayî pêwist e. Û divê perwerdeya teknîk û pîşeyî jî li ber dest û li gîhaştinê be. Ango li gor her kesî/ê divê karibin bigihêjin wê perwerdeyê.

Divê perwerdehî, divê li gor pêşveçûna kesayetî, bihêzbûna birêziya maf û azadiya mirovan be.

Hemî gel; divê fêma nijadî û olî, xweşdîtin û hevaltîyê teşwîq bikin û çalakiyên Neteweyên Yekbûyî yên aştîxwaziyê pêş de bixin. Malbat, xwedan bijarteyê ya cûreya perwerdeya zarokan in.

Madeya 24an a Peymana Mafên Nekanyaran a Neteweyên Yekbûyî

Sekreteriya Neteweyên Yekbûyî a derbarê Mafên Nekanyaran, tenê beşeke derbarê mafên nekanyaran de radiweste ye. Ev rêxistin, di 3ê Kanûna 2006an de mafê nekanyaran bi pêşwaziyê wekî dilxwastinî derxistiye holê.

Madeya 24an bi taybet li ser mafê nekanyaran radiweste. Li gor vê madeyê;

✓ Dewletên pejirêner, mafê nekanyaran dinasin.



Dewletên pejirêner vî mafî bêyî ku cudahiyê têxin navberê, bi armanca bigeha wekheviya firsendê û bi derbarê sîstemeke bergeh a her astê û seranserê jiyane de hînbûnê divê pêk bînin.

✓ Ji bo pêşveçûna potansiyela mirovan, pêşveçûna rûmet û xwenirxan û bihêzkirina maf û azadiyên bingeh û birêziya cûrbecûriya mirovan

✓ Digel kanîn, şareza û hilberîneriya kesayetan, pêşvebirina potansiyela şarezayên hişmendî û fîzîkî ya nekanyaran

✓ Pêkanîna bi şeweyeke çalak a nekanyaran tevî civakeke azad

✓ Di pêkanîna van mafan de dewletên pejirêner; divê nekanyaran, di bingeha nekanyariyê de ji ji perwerdeya gelemper, bêpere û pêwistiya perwerdeya seretayiyê dûr nexin. Divê nekanyar, di civaka ku tê de dijîn, bi kesên din re wekî wekhev bi bergehî, kalîte û bêpere bigihêjin perwerdeya seretayî, navîn û amadehiyê.

Divê xwestekên nekanyaran, aqilmendî bi cî bîne. Ji bo ku nekanyar, di nava perwerdeya gelemper de bandoryar bibin, divê destek û piştgiriya bide wan. Divê bergiriyên piştgiriya yê kesane kirî û bandoryar wekî beşdarbûneke rasterast û lihev kirî ji bo pêşveçûna akademîk û civakî pêk bîne.




✓Dewletên pejrêner, ji bo ku nekanyar, bê asteng tevî civakê bibin û xwe endamekî/ê civakê bibînin, divê perwerdeya şarezayên jiyîn û civakê pêk bînin. Di vî warî dewletên pejrêner; divê alav û şeweyên hînkirina Elîfbaya Braille, senaryoyên alternatîv, modên cûrbecûr, têkîlî û hwd. û piştgiriya hevalbendan asan bikin.

Divê zimanê nişandeyê bide hînkirin û pêşveçûna navnişana nekanyarên nebihîstyar asan bike. Divê bi alavên guncawtirîn ên ziman, mod û têkiliyê ji bo asta akademîk û civakî ya nekanyarên nebîna û nebihîstyar derkeve bilindtirîn astê, bergiriyên pêk bînin.

Di bicîkirina vî mafî de dewletên pejrêner, divê mamosteyan, derbarê Elîfbaya Braille û zimanê nişandeyê de perwerde bikin an di vê perwerdekirina van mamosteyan de jî bergiriyên zexm bigirin.

✓Dewletên pijirêner, divê destûrê bidin ku nekanyar bi awayeke wekhev û azad derbasî perwerdeya bilind bibin û di vî warî de divê rê û rêbazan li ber wan vekin. Bi vê armancê dewletên pejrêner, divê ji bo nekanyaran bi awayeke hişmendî cîhê hêwirîn an starbûnê ava bikin.



ALERJÎ

DR. RODÎ ZANYAR

Alerjî; reaksiyona(berteka) laşê mirov a dijî madeyên biyanî ye. Alerjî bertekê, ne asayî ya pergala bergirîye laşê mirov e. Reaksiyonên alerjiyê spêsîfîk in takekesî ne, her made di her kesî de alerjiyê pêk neyn ne.

Pergala bergirîye, ji bo parastina laşê mirov, dijî mîkrob û madeyên biyanî antîkoran hildiberîne. Ev antîkor pirranî ji bo made û mîkrobên xeternak tên hilberîn lê carinan hinek mirov dijî madeyên bêzîrar jî antîkoran hildiberîn û dijî van madeyên bêzîrar bertekê ne asayî nîşan didin.

Heke mirov xwediyê laşekî hesas be ango alerjîk be madeyên biyanî bikevin ku devera laşê mirov li vê deverê reaksiyona alerjîk pêk tînin. Reaksiyonên alerjiyê li her deverê her lebatê awayekî cûda rû didin.



Radeya/cidîtiya reaksiyonên alerjiyê kesane ne û guherbar in. Ji tahrîşeka sivik a çerm bigire heta anafilaksiye ku carinan bi mirinê encam dide cihêreng in.

Nîşanên Alerjiyê

Nîşanên allerjiyê guherbar in. Li gorî taybetmendiyên madeyê dikeve laşê mirov (jê re dibêjin antîjên), cihê ku dikeve laşê mirov (çerm, dev, bêvil, rehên hilmij danûstandinê, rûvî...) û berteka ku laşê mirov dide taybetmendîya alerjiyê diguhere. Gelek cureyên kategorîzekirina alerjiyê hene. Hinek caran li gorî madeyên alerjiya pêk tîne, hinek caran li gorî organên alerjî bipêk hatiyê tên kategorîzekirin. Navên alerjiyên organan (lebatan) jî cûda ne.

Ezê niha bi kurtasî behsa alerjiyên berbelav bikim.

Rînît

Heke alerjî di bêvilede(poz) de pêk be jê re dibêjin Alerjîk rînît. Alerjîk rînît gelemperî ji ber tozê gîha, mûyên ajalan û kêzikên jê re dibêjin maytan(mite) pêk tê.

Alerjîya Pêvedane/Pêgirtina

Alerjîya pêvedana: ji ber gezkirin an jî pêvedana hinek kêzik û ajalên pêk tê. Kêzik û ajalên zêdetir dibin sedema alerjîyê; mêşên hingiv û mêşên zer in. Pêvedana mar û dûpişkan jî carinan pir xetere dibe carinan anafilaksî jî pêk tê.



PÊVEDANA KÊZIKAN

Piştî pêvedane;

Cihê ajal pêvedayî an gezkirî gelek diwerime
Çerm dixurê û lîr çêdibin
Kuxîn bêhnçikîyîn dest pê dibe
Carinan jî anafilaksî pêk tê

Alerjîya Dermana

Alerjîya Dermanan: ji hemû alerjîyan, yê herî berbelav alerjîya dermanan in. Dermanên herî zêde dibin sedema alerjîyê rêza yekem de antîbiyotîka binavê pênîsîlîn, rêza duyem de dermanên êşbir hene.



Ji sedemên alerjîyê de dermanên êşbir û antîbiyotîk cihêkî zêde digirin

Şikla alerjîya ji dermanan guherbar e, carinan tenê nîşanên sivik pêk tên carinan jî dev lêv û ziman diwerimin, danûstandina bêhnê dijwar dibe, kêman caran jî anafilaksî pêk tê.

Dermatît û Lîr

Dudo şiklên alerjîya çerm hene. Yek jê re dibêjin urtîker (kurmancî lîr) a din jî dermatît e. Di urtîkerê der her deverên çermê mirov diwerime û dixurê carinan jî dev û lêv jî diwerimin. Urtîker zêdetir jiber wergirtina dermanan pêk tê Dermatît (êgzêma) hêdî hêdî çêdibe û dereng jê diçe. Tiştên zêdetir dibin sedema êgzêma deterjan lateks û metal in.



Xwurîn
Sorbûna çerm
Verimîn
Heke alerjî tûnd be çermê mirov tê qeşartinê
jî

Anafilaksî

Alerjîya herî tûnd re dibêjin anafilaksî. Di anafilaksî ye de metirsîya mirinê zêde ye. Anafilaksî, ji wergirtina hinek xwarin an dermanan an jî ji ber pêvedana (pêgirtina) kêzik mêş mar dûpişkan pêk tê. Heke di wextê de neyê dermankirine ewil şoq rû dide û dû de jî jidestdana jîyanê.



Simptom an nîşanên anafilaksî ye

Jibîrveçûn
Daketina tansîyon
Dijwarbûna hilm/bêhn danûstandine
Mahdhevketin, vereşîn

Gêjbûn, hişçûyîn
Bilezbûn û lawazbûna rehjen (nabiz)
Nexşerê û Serlêdana Bijîşk
Heke di laşê mirov de alerjî pêk hat

Pêwîste ku berî her tiştî mirov ji madeyê alerjîker dûr bisekine. Heke di destê mirov de dermanên alerjîyê hene mirov dikare yekser dermanê alerjîyê werbigre. Eger ji dermanên alerjîyê mife nekir divê mirov zûtirîn serlêdana bijîşk bike. Heke piştê wergirtina dermanekî alerjî pêk hat divê mirov yekser dev ji vî dermanî berde û bijîşkê xwe agahdar bike.

Heke alerjî gelek tûnd be wekî anafilaksiye be divê mirov ji bo ambulansê demildest gazî tîmên heware bike. Li Tirkiyê ji bo heware hûn dikarin telefonî 112 bikin.

Hinek mirov hene, alerjîya wan pirr xeternak dibe û eger demildest ne werin dermankirin anafilaksî rû dide, muhletê nabe ku nexweş bigihê nexweşxane. Ji bo nexweşên vî rengî derziyên adrenalîn hatine amadekirin divê di berîka wan de ew derzî hebe heke alerjîyê rû da yekser ew derzî bê lêxistin.

Heke alerjî cidî be ji bo pênasikirina madeyên alerjîk û mîsogerkirina dermankirinê divê mirov serlêdana bijîşkê alerjîyê bike.

Rîska Alerjîyê

Di zarokan da alerjî hîn zêde pêk tê
 Di yên malbatê wan de alerjî heyî de rîska
 alerjîyê zêdetir e
 Yên nexweşîya astimê bi wan re heyî de
 alerjîyên din jî zêdetir pêk tên

Venasîn an Teşxîs

Venasîna alerjîyê carinan pir hêsan e, carinan
 pir dijwar e, carinan jî ne mimkûn e. Pîranî
 caran nexweş alerjîya xwe xweserê pênase
 dike û dibêje piştî wê xwarinê, wî dermanî,
 wê pêvedanê...hwd aha bû. Carinan jî ji bo
 pênaskirina madeyên alerjên divê gelek tehlîl
 û testên alerjîyê bên kirin.

Tehlîlên xwînê

Di tahlîlên xwînê de asta antîkora giştî ya ÎgE
 (total ÎgE) an jî asta antîkorên ÎgE yên
 spêsiîfîk (Spêsiîfîk ÎgE antîkorê dijî. ? madeyî)
 tên tespît kirin. Li gorî encamên tehlîla
 îhtîmal heye ku alerjên bê tespîtîkirin

Testên Alerjîyê

Li gorî standardên navneteweyî madeyên herî
 zêde dibin sedema alerjîyê hatine amadekirin
 bo çermê mirov yek bi yek tên tetbîqîkirin.

Piştî demekê heke kîjanê de reaksiyon çêbe,
 çêrm biwerime, bixwire sedema alerjîyê ew e
 an ew in.



Testên alerjîyê hertim encame nadin. Di
 naveroka testên alerjîyê yên standard de
 derdorê 24-36 heb alerjên hene, eger alerjîya
 we dijî wan madeyan di naveroka testê de
 hebe ya encamê bide lê madeyên ku alerjîyê
 we heyî di nav testê de tune be, encame nade.

Dermankirin

*Dermankirina alerjîyê pîranî caran
 simptomatîk e.*

*Ji alerjên dûr mayîn; heke alerjenê dibe
 sedema reaksiyona alerjîyê hatibe tespîtîkirin
 pêwîste ku ji vî alerjênî dûr bisekinê. Xûrek
 derman an toz heke mimkune divê em jê dûr
 bisekinin. Dema alerjên holê rabû alerjî jî
 holê radibe.*

Derman: Gelek derman ji bo dermankirina
 simptomên alerjîyê tên bikaranîn.

Tu dermaneke alerjîyê bi temamî holê rake tune ye, derman tenê nîşanên alerjîyê çareser dikin. Bijîşk li gorî tûndiyê alerjîyê dermanan pêşniyar dikin.

Îmmunoterapî: Heke alerjênê dibe sedema alerjîyê hatibe tespîtkirin îmmunoterapî alternatîfeke dermankirine ye. Di bin çavdêriya pîsporên alerjîyê de alerjên bi mîqdarên pirr pirr kêr didin laşê mirov û çaverêtî dikin ku laşê mirov hêdî hêdî hînî alerjên bibe û bertekên tûnd ne bide. Îmmunoterapî salan diajo ye, ji bo hinek nexweşan kêrhatî ye

Adrenalîn: Ji bo yên di laşê wan de anafilaksî an jî alerjîyên pir tûnd çêdibin û nikarin xwe bigihînin nexweşxaneyê ye derziyên adrenalîn hatine amadekirin. Divê ev derzî hertim li ba nexweş bin, heke hewcedarî çê bû nexweş vê derzîye demildest xwe dixe.

Di dawiyê de em dikarin bêjin alerjî reaksiyonên ne asayî ne divê mirov miqate be carinan pirr xetere dibin, tiştêkî bi temamî alerjîyê derman bike nîne tiştê herî girîng xweparastine û heke xweparastin ne mimkûne pêwîste dermanan bikarbîne.



DERZİYÊN ADRENALÎN YÊN AMEDEKIRÎ

BEKO

Un film de NIZAMETTIN ARIC



SÎNEMAYA KURDÎ

KILAMEK JI BO BEKO

Kilama Mirovên Jibîrbûyî

DILAZAD ART | dilazadart@gmail.com



Destpêk

Di vê xebatê de filmekî ku di sala 1992an de ji aliyê Nîzamettîn Arîç ve li Ermenistanê hatiye kişandin yê ji aliyê çend têgehên sereke yên sînemaya kurdî ve were analîzkirin. Ev têgehên sereke jî ev in: Sînor, çiya, jin, rêwingî û zarok. Ev film, yekem filmê ku ji hela kurdekî bakur ve bi kurdî hatiye kişandin. Lê mixabin ji ber qedexeyên kurdî film ne li axa Kurdistanê, li Ermenistanê hatiye kişandin. Dîsa jî ji bo sinemaya Kurdî heja ye ku were analîzkirin.

Nasnameya Film

Derhêner: Nîzamettîn Arîç

Derhênêrê Dîmenê: Thomas Mauch

Senaryo: Nîzamettîn Arîç û Christine Kernich

Lîstikvan: Nîzamettîn Arîç (Beko), Bezara

Arsen (Zînê), Lusîka Hesên (Zeyno),

Cemalê Jora (Cemal)

Welat: Ermenistan û Elmanya

Ziman: Kurdî, Tirkî

Dirêjahî: 110 dq.

Muzîk: Nîzamettîn Arîç

Sal: 1992

Kurteya Film

Kilamek Ji Bo Beko yek ji filmên herî pêşîn ên Kurdî ye. Mijara filmê li ser rêwîtiya dirêj ya lehengê filmê Beko ye. Beko li birayê xwe yê ku ji bo neçê leşkeriya Tirkiyeyê reviyaye, digere. Destpêka filmê li Kurdistanê derbas dibe û di dawiyê de bi hatina Elmanya ya Beko bi dawî dibe. Film bi zaravayê Kurmancî hatiye kişandin û beşdarî gelek festîvalên navnetewî bûye. Herwiha Kilamek Ji Bo Beko gelek caran di televîzyonên Kurdan û Ewropîyan de jî hate nîşandan.



Pêşkêşkirina Filmê

Film li Elmanyayê dest pê dike. Bi awayekî flashback Beko vedigere rojên berê. Li gund birayê Beko, Cemal, naxwaze here leşkeriya Tirkîyeyê bike. Ji bo vêna dixwaze here tevî pêşmergeyan bibe. Bi vê armancê jin û zaroka xwe li pişt xwe dihelê û derdikeve derveyî Tirkîyeyê. Piştî demekê leşkêrê Tirkîyeyê bi ser gund de digre. Gundîyan li meydana dide hev û ji muxtar listeya niştcehên gund dixwaze. Ji gundîyan dipirse; “Kanî Cemal Öztürk?” Serleşker çend pirsan dike lê tu kes bersivê nade. Wê hingê serleşker bi hêrs dibê û dibêje li vir (Tirkîye ye) tenê (zimanê) Tirkî heye. Duvre serleşker tê ba Beko û ji Beko dipirse: “Kanî birayê te?”

Beko dibêje: “Li Enqereyê dixwîne.” Serleşker bihêrs li Beko dixê. Berê xwe dide gundîyan û ji wan re dibêje: “A niha guhê xwe vekin û li min baş guhdarî bikin. Hûn alîkariya me nakin. Pêşeroja gundê bi vî rengî nîne li van deran. Muxtar, tu çima ji me meaş distînî. Dibê tu bihêlî ku herkes bi dewleta Tirkîyeyê ve rast bê girêdan... Baş neketiye serê we. Bê destûra me li vê herêmê çûkek jî dibê nefire. Tiştêkî ku ne li gora me çêbe, wek gundên derdorê yê gundê we jî biherife. Li ba me, ji kesê ku ji terorîstan re, ji PKK re alîkariyê bike merhemet nîne, we fehm kir?”

Leşker, Beko bi xwe re dibin. Serleşker dibêje; “Heta ku birayê wî (Cemal) neyê ez wî bernadim.”



Piştî demekê li cemsa leşkeran erîş tê kirin. Leşker ji bo ku bikevin pevçûnê ji seyarê xwe diavêjin. Tenê leşkerek li ba Beko dimîne. Beko li nav çavê wî dimeyzîne û xwe ji cemsê diavêjê û baz dide, dibe qaçax. Beko bêçaretî derbasî Sûriyeyê dibe. Li vir dikeve pey şopa birayê xwe Cemal. Li vir bi koma Pêşmergeyan re derbasî Iraqê dibe. Dema Beko û hevalên xwe tèn zarok bi dengê bilind dibêjin: “Pêşmerge hat, pêşmerge hat” û diçin pêşwaziya pêşmergeyan. Beko û hevalên xwe diçin bin konê Zeyno. Zeyno jineke zana ye. Mêvan li dora Zeyno rûdinin. Zeyno wek edetî bixêrhatina mêvanê xwe dike. Pêşmerge dipirse “Eskerê Seddam Hiseyîn... We reha dihêlin?” Zeyno: “A niha ketine hela hela Îranê. Dibe ku sibê dusibê rewş bê guhertin.” Şêro ji Beko dipirse: “Navê te çi ye bira?” Beko: “Navê min Beko ye ezbenî. Ji Kurdistanê Tirkî me, ji deştê Sirûcê me.”

Koma pêşmergeyan berê xwe dide aniya şer. Beko li wir dimîne. Ji Beko re dibêjin ku me birayê te dît emê ji te re ragihînin. Zeyno, Beko bi niştecihên wir dide naskirin. Di civatê de li ser şerê navbêra Iraq û Îranê de diaxivin. Belengazî û bêçaretîya xwe tînin ziman. Mirovekî civatê dibêje: “Li vira li serê vî çiyayî heta niha lingê tu askerê Ereb li vî erdî neketiye. Ez dizanim bê çi dibêjim. Panzdeh sala li kêleka Mela Mistefa Berzanî pêşmerge bûm. Ewana şerê çiya nikarin bikin.”

Di wê rewşa xerab de jî mirovek dersa xwendin û nivîsandinê li ser texteyekî ku sipartine zinarekî dide. Li wir dersa Kurdî dide. Dûv re Zeyno nêzî Beko tê û rewşa zarokan ji Beko re dibêje: “Zarok bêhtir sêwî ne. Bê dê û bav in. Bavê hin zarokan pêşmerge ne. Van sêwîyan pîrekek ku navê wê Sîneme xwedî dike.”

Zarok her çiqas di nav şerekî de bin jî dîse zarok in.

Dû re Zeyno ji Beko dixwaze ku ew jî bi zarokan re mijûl bibe.

Zarok her çiqas di nav şerekî de bin jî dîse zarok in. Zarok ji xwe re bi efra dileyizin. Bi lîstika gur û bez dileyizin. Beko diçe ba Zînê. Zînê bê bav û bê dê ye. Beko pê re henekan dike. Çend lîstikên destan nîşanî wê dide. Lê Zînê bi kosiye xwe re dileyîze.

Zeyno ji zarokan dixwaze ku dara û şîlanan bînin. Dema zarok diçin dara bînin Beko jî bi wan re diçe. Di vegeê de Beko ji bo ku navên zarokan jiber bike bi zarokan re lîstikekê dileyîze. Beko ji zarokan dixwaze ku çi hunera wan hebê nîşanê bidin û xwe bi wilo bidin nasandin. Zarok yek bi yek xwe bi hunerên xwe didin naskirin. Beko tê ba Zeyno û jê re derdê xwe dibêje: “Ez li hêviya pir tiştên dî bûm. Li ba me dibêjin Kurdistana Iraqê cihê rizgarkirî heye, cihê milletê me wê derê saxlem e. Û... Li vir... Tu çi dibêjî, gava ez birayê xwe bibînim ez biçim ku?” Zeyno: “Çi ji min dipirsî? Ez naçim tu cihekî din. Vira welatê min e.”





Li vir Beko çend rojan li benda xebereke pêşmergeyan dimîne. Di vê navberê de bi zarokan re hevaltiyê dike. Bi zarokan re lîstikan dileyîze. Porê zarokan diqusîne.

Beko û zarok ji bo ku avê bînin ber bi newalêke ve diçin. Zarok pirsên ku meraq dikin ji Beko dipirsin. Zarokek dipirse “Apê Beko zarokên ba we giş dikarin herin dibistanê?” Beko bersivê dide: “Hemî nikarin, lê yên dikarin divê bi Tirkî xeber bidin.” Zarok dibêje: “Çima Tirkî?” Beko dibêje: “Li Tirkiyeyê Kurdî qedexe ye.” Zarok dibêje: “Li Iraqê jî dibê meriv bi Erebî xeber bide.” Di vegeerê de balafirên şer li asîman difirin. Zarok ji tirsê xwe davêjin nava şikeftan.

Zînê nexweş dikeve. Beko tê ba Zînê. Ji Zînê re çîroka Mem û Zînê dibêje. Dû re bi awayekî stranî dilorîne.

Siwariyek ji nava çiya bilez ber bi kon ve tê. Bangî mirovan dike: “Hele werin min xeberên baş ji we re anîn. Şerê nava Iraq û Îranê xilas bû. Êdî şer qediya. Îran û Iraq li ser aştîyê disekin.” Mirov dikevîne heyecanekê. Heman dixwazin herin gundên xwe. Siwarî tê ba Beko û ji Beko re dibêje: “Şêro birayê te nedîtiye.”

Balafirên şer bi ser gund de digrin û gund bomba baran dikin. Beko ji dûr ve vê kersatê dibîne.



Piştî ku balafir ji herêmê diçin Beko xwe berdide nav gund. Xaniyê nîvherabe hilweşiyane, jin û mêr û zarok tev mirîne. Laşên wa belav bûne. Tenê Zînê birîndar filitiye. Beko dirajihe Zînê.

Ji vir pêve film li Elmanya didome. Zînê li nexweşxaneyekê razandiye. Beko ji bo birayê xwe li Hambûrgê diçe şeva pirozbahiya Newrozê. Dîmen bi alaya Kurdistanê dest pê dike.

Li wir yekî bi navê Kazo li ser birayê Beko agahiyan dide Beko. Kazo dibêje, dema ku sînor derbas dike tê girtin. Cezayê wî tê birîn û wî dişînin eskeriyê. Gundê we li ber valakirinê bû. Yê gundê we bişewitînin. Gundiyan ji bo koçkirinê xwe amade dikir.”

*Cemal di operasyonekê de bi guleyekê tê kuştin.
Film bi vî dimenî diqede.*



Tegehên Serekê yên Filmê

Sînor

Di filmê Kilamek Ji Bo Beko de sê dewlet hene ku Beko bi awayekî veşartî sînoran derbas dike. Ku em çûyîna Beko ya Elmanya jî bi sînor ve girêbidin Beko jiyaneke di nava çar dewletan de dijî. Beko bi sedema ku birayê wî ji leşkeriyê reviyaye tê girtin. Dema diçin qerekolê di rê de erîşî cemsa eskeran dikin. Beko vê rewşê wek firsendekê bi kar tîne û ji destê leşkeran direve. Ji Sirûcê ku li ser Tirkîyeyê ye derbasî Sûriyeyê dibe. Ji sînorê pêşîn bi vî awayî derbas dibe. Devera ku diçe zimanê wan jî wekî yê Beko ye. Ew jî Kurd in ku ji wan re tê gotin Kurdên Sûriyeyê. Heman mantiqa nav ji bo Kurdên Tirkîyeyê, ji bo Kurdên Îranê û ji bo Kurdên Iraqê jî bi kar tê. Piştî ku Beko direve diçe Sûriyeyê li wir dekeve pey şopa birayê xweyî ku ji ber eskeriya Tirkîyeyê reviyaye. Beko bi alîkariya pêşmergeyan diçe Iraqê. Ev cara duyemîn e ku Beko ji sînor derbas dibe. Li Iraqê şerê Iraqê û Îranê heye. Devera ku Beko diçe Kurd lê dijîn.

Di vir de her çiqasî Beko di nav sînorên sê dewletan de geriyabe jî di siruştê erdnîgariyê de tenê li welatên Kurdan geriyaye. Lê Beko bi awayekî dizî ji Tirkîyeyê derbasî Sûriyeyê dibe û ji wir jî bi awayekî dizî derbasî Iraqê dibe. Mirovekî ku ji Diyarbekirê here Qamişlo û ji vir here Hewlêrê û ji vir jî here Mehabadê her çiqas di nava çar dewletan de bi pasaport geriya be jî di rastiye de tenê li welatekî geriyaye ku ew jî Kurdistan e. Di dawiya filmê de Beko derbasî Elmanya dibe. Di vir de derbasbûna sînor xuya nake lê em dizanin ku bi awayekî veşartî ango bi rêyên qaçax derbasî Elmanya bûye. Bi vî awayî di filmê de metafora sînor ku di nava gelê Kurd de wek kelemekî ye cihê xwe digre.

Çiya

Di filmê Kilamek Ji Bo Beko de jiyana karakterên filmê tev li serê çiya derbas dibe. Kesên ku ji ber şer reviyane xwe sipartine çiyayan.



Jin û mêr û zarok û rêwing û kesên qaçax xwe li çiya digrin û xwe dispêrin bextê çiya. Çiya di vî filmî de şîn in. Çiya van mirovan ji erîşan dipareze. Di dawiyê de gundê li derûdora çiya ji hêla balafiran ve tê bombebarankirin.

Jin


Di filmê Kilamek Ji Bo Beko de jina bi navê Zeyno wek rêvebirekê, wek serokekê hatiye nîşandan. Zeyno, kesên ku ji ber şer reviyane li dora xwe civandine. Ji bo debara van mirovan sistemek ava kiriye. Kesên ku xwarinê çêdikin hene, kesên ku dara didin hev hene, kesên ku dersa zarokan dide heye. Bi vî awayî Zeyno serokatiya wan kesan dike, mîna dewlete piçûk tevdi gere. Zeyno li vir mêvanan diezimîne. Civîna li bin konê xwe li dar dixe. Zeyno jineke zana ye. Mêvan li dora Zeyno rûdinin. Zeyno wek edetî bixêrhatina mêvanên xwe dike. Evna nişane ye ku Kurd çiqas qiymet didin jinê. Zeyno serê civatê rûdinê û mêvan tîni li dora wê rûdinin. Xwarin ji wan re tê. Ev jî mêvanperweriya Kurdan nîşanî mirov dide. Pêşmergeyek ji wan ji paşila xwe diyariyekê derdixe û dide Zeyno. Ev destevala neçûyîna deverekê ye. Îro jî Kurd dema diçin mêvandariyekê yan devereke xerîb destevala naçin. Bi kurtasî taybetmendiya desthilatdariyê bi kar tîne. Beko ji bo çareseriyê xwe bi Zeyno dişêwîre. Zeyno girêdayî axa xwe ye ku ev welatê wê bi xwe ye. Dema her kes ji bo Zeyno diçin gundên xwe Zeyno bi tena serê xwe li konê xwe dimîne ku ev payebilindiya jina Kurd nîşan dide. Zeyno bi cil û bergên xwe û sergirêdana xwe mîna jineke otoriter nîşan dide.

Rêwingî

Filmê Kilamek Ji Bo Beko rêwingiyeke çûyinê ye. Ji Kurdistanana Tirkiyeyê ber bi Kurdistanana Sûriyeyê ve. Ji wir jî ber bi Kurdistanana Iraqê ve. Di dawiyê de çûyîna Elmanya ye. Ev rêwingî bi rêyên qaçax bi awayekî veşartî pêk tên. Rêwingiya Beko ya Suriyeyê û ya Iraqê di nava welatekî parçekirî de pêk tê. Beko ji ber zilma dewleta Tirkiyeyê direve. Lê li Iraqê jî şerê Iraq û Îranê heye. Li vir jî jiyan hêsan nîne. Ew hêviyên ku Beko ji bo Kurdistanana Iraqê dikirin yek bi yek pûç dibin. Dû re ji neçarî Beko, Zîna piçûk ya birîndar jî bi xwe re dibe Elmanyayê.

Zarok

Di filmê Kilamek Ji Bo Beko de keçika bi navê Zîn karakterek e ku can daye filmê. Zîn keçikeke bêbav û bêdê ye. Ji ber şer reviyaye. Li binya çiyayekî komek kon hatine vedan. Beko, Zînê li vir nas dike. Beko girîngiyeke mezin dide Zînê. Di dawiyê de ji bombebaranê tenê Zînê birîndar difilite. Beko wê bi xwe re derdixe Ewropayê. Ango diçe Elmanyayê. Li vir jî bo dermankirinê wê li nexweşxaneyekê radizîne.



Encam

Wek di vê xebatê de hat dîtîn, filmê Kilamek Ji Bo Beko, trajediya Kurdan nîşan dide. Qedexebûna ziman, çand, huner û nasnameya Kurdî di her dîmenê filmê de xuya dike. Ji ber ku welatê Kurdan di navbera çar dewletan de hatiye parçekirin sînora di jiyana Kurdan de têgeheke sereke ye. Di literatura Kurdan de navlêkirina bakur, başûr, rojhilat û rojava, bi sînoran ve girêdaye, ango navên coxrafî ne. Çiya, di hemû serhildanên Kurdan da bûye cihê xwespartinê. Ji ber vîna ye ku Kurd û çiya her dem bi hev re tene bilêvkin.

Her çiqas civaka Kurdan payeya bilind dabe jinê jî, lê di jiyana rojane de jin di asta duyem de maye. Ji ber vîna ye ku sînemagerên Krd di her filmên xwe de xwestine jinê payebilind bikin. Jiyana Kurdan jiyaneke rêwingiyê ye. Di her filmekî sînemaya Kurdî de çûyînek an vegerek heye. Zarok, pêşeroja neteweyan e. Ji ber vîna ye ku di filmên Kurdî de trajedî û berxwedana zarokên Kurd ya ji bo zimanê Kurdî derdikevê ber çavan.

Nisebîn/Êlih, Îlon, 2019





Jiyana Gundan

RECEP ÇÎÇEK

Çanda gundan di çanda Kurdî de cihekî girîng digire û bi min em dikarin bibêjin çanda gundan maxa çanda Kurdî ye.

“

Çanda gundan di çanda Kurdî de cihekî girîng digire û bi min em dikarin bibêjin çanda gundan maxa çanda Kurdî ye

”

Bi qasê 100 salek berî vê paş vê gund li ber çeman li ser giran ava kiribûn ku erdên kepir biajon avbidin. Dema Osmanîyan gund erd/zevî bêqîmet bûn kesî erd nedixwest çimkî him traxtor tunebûn, alet kotan tunebûn, erdê kê yê bi tapî hebûya osmanîyan baca aşarê jê distand û xortan wan bi darê zorê dibirin leşkeriyê dişandin şer.

Tê gotin leşkerên osmaniyan tên gundê Safê ku erdên gund bi zorê li ser gundiyan tapî bikin, kalikê min ê Mehmoyê Bozên rehmetî û hevalê wî Siloyê Heydêr ji gund direvin xwe di şikefta gund de vedişêrin ku erdan li ser tapî nekin. Xwedê ji gundiyan razî be kalikê min û siloyê heydêr îxbar dikin leşker diçin herduya tînin her yekî 500 donim erd li ser tapî dikin. Pir neçû hatin ku kalikê min bibin şer, kalikê min reviya herdu birayê wî yê biçûk birin. Herdu jî venegeriyan.


Jiber tunebûnê û zora osmaniyan erd bêqîmet bûn her malekê ji bo zexîreya xwe bes şûna kêlek (10 donim) erd encax dikaribû biçanda lê ew jî nivê



erd diçandin nivê din şûv dihiştin ji bo sala din jî şûvê biçînin alî din şûv bihêlin.

Erd bêqîmetbûn lê pez biqîmet bû. Çimkî pez bereket bû, şîr dew penêr, mast, firo, toraq, rûn, çortan, hirî û heta bişkulên pêz jî kêrî gundiyan dihat pê nan dibişartin. Erd li hemberî pêz ewqas bêqîmet bû ku ewçax xwedîyê gundan gundê xwe bi keriyek pez re diguherîn. Ew axa aniha serê xwe ji gorê rakin li gundê xwe yê bi keriyek pez re guherîn binihêrin wê îcar jî ji qehra re bimirin...

Firo bi şîrê peze nû zayî çêdibû ku me ji wî şîrî re digot şîrê zêç. Şîrê zêç gava nêzî kelandinê tîr dibû û diqetiya loplopî dibû. Êdî ew dibû firo, me an dims an jî şekir bi ser firo direşand û germe germ dixwar.



Piştî osmanî hilweşiya komar û meclîs çêbû atetirk baca aşarê ji holê rakir leşkerî jî ji gişkiyan re bû mecbûrî. Gundiyan li der dora çêrez û fistiq diçandin lê bi qasê ermeniyan bi karê tirî nizanibûn. Nêzî payîzê rez dibirîn ku bikin şîre. Li nav rêz şûna odayekê erd ji kevir û kêrsekan paqij dikirin ax dûz dikirin û avdiresandin. Gava ew herî nedam(nemlî) dibû îcar jî loxê xaniyan têr lox dikirin ku herî pihêt bibe. Gava herî pihêt dibû ewder dibû miştaxe, yanê bêndera tirî/fistiqan.


Qirş, dar, beroş, qoşxane dianîn li kêleka miştaxê hazirîya kerge dikirin. Keşefe çêdikirin ku ew alaw wekî sedyeyên berê bû. Du rotên qewîn metrekê dûrî hev paralel dadianîn û text li ortê dixistin ku li ser textan tirî barkin gava tijî bû yek paşî yek pêşî bi serê rota bigrin keşefê binîn miştaxê tirî bikin bênder. Mêran tirî pêdikir av jê derdixist jina jî ava tirî dikeland. Gava ava tirî tîr dibû jina hevîr çêdikir bi hevîr xelek çêdikirin û diavêtin nava ava kergê tede dikelandin pir xweş dibû û me jê re digot kehke. Lewma piranî ji sîmîten sûkê re dibêjin sîmît lê em dibêjin kehke.

Lê gundiyan dîsa jî dev ji pêz berneda. Pez bereket bû, kulfetê malbatê çiqas be jî pêz gişkî xwedî dikir. Gundiyan jibo qatixa payîzê çortan çêdikirin ku suryanîyan jê re digot Gabûla. Çortan, dew dikeyan rûn jê derdixistin û dew berdidan tûrekî paçî ji %100

pembo çêkirî û di sîyê de bi darve dikirin. Gava av jê diçû xelas dibû ew dewê tîr li ber royê heta wekî kêvir hişk bûye radixistin. Gava hişk dibû, dibû çortan vedişartin, payîzê pez ji şîr hildikîşîya çortan di avê de dihelandin dîsa dikirin dew û şorbedan. Çortan qatixê payîzê bû.

Piştî traxtor û alet derketin xwediye gundan ên birçî bûne axa, gundiyan erd xwestin ajotin çandin. Berê "mixtar" jî tune bûn çimkî berê me ji mixtaran re digot "Keya". Ewçax jiber ku dewletê meaş nedidan Keyan kesî Keyatî nedikir. Li gundan kesên ciwêlek yanê kesên bêmilik hebûn axayê gund ji malbateke ciwêlek re şikartek diçand ku zilamê malê ji gund re keyatîyê bike.

Payîzî gundiyan pere li erdan direşand û havînî duqat sêqat pere rakirin. Jinan de'wa xatûniyê kirin hêdî hêdî pez kêmbû.



Gubre derket kooperatîf çêbûn gundiyan taximên hev ajotin hevûdu kuştin aliyekî ji gund barkir aliyê din erdên wan zeft kir.

Dewletê meaş dane Keyayan, axayên ku jibo Keyatîyê bike ji ciwêlek re şikarte diçand Keyatî ji dest ciwêlekan girtin bi xwe bûn Keya. DSÎ'yê av anî ser erdan. Gundiyan zincîr li koka mêwa tirî werda û bi traxtorê hilkir erd kire pembo.

Kar li ser erdan pir bû şivanan şiv avêtin gotin "em ê êdî bişixulin şivaniyê nakin!" û şivantî bû wek rûreşî. Aniha li deşta me bes li 2 gundan pez heye ewan jî salê 100 hezar lîre heqê şivên didin çimkî şivan tune ne. Axir bi dawiyê re pez nema. Rez nema. Gundî xanî li ser erdên xwe lêkîrin ji gund dûrketin.



Wêne: Pira Mala Badê – 190

LI ŞOPA DIROKÊ


PIRA MALA BADÊ Û DEWLETA KURD A MERWANÎ

Xerzî Xerzan

Pira Mala Badê, weke ku ji navê wê pirê jî tê fêmkirinê, li ser navê Bad ê Dostik hatye avakirin, ê ku damezrenerê Dewleta Merwanî ye...

Bad, (an jî Baz) di sala 991-an da, di şerê li gel Hemdaniyan pêk hatye da hatye kuştin û xwarzîyê wî Hesên ê Merwan ketye şûna wî û sinorên dewleta xwe berfirehtir kirye... Di dema Bad da, navê dewleta wî ne Merwanî ye, piştî Hesên ê Merwan, navê dewletê dibe Merwanî...

Lê siltanên Merwanî, bapîrê xwe, Bad ê mezin ji bîr nakin û di dema Ebû Nasir ê Merwanî da, vê pira bêhempa, a ku ji hêla mîmarîyê ve li seranserê dinyayê nav û deng daye, li ser navê wî ava dikin. Avakirina wê jî, derûdora salên 1040 û 1050-an e..



Hêjayî gotinê ye ku, navê dewletê Merwanî ye, dibe ku ji hêla cînarên wan ve wiha hatibin binavkirin, lê malbata Merwanîyan di civaka kurd da, wek ” Mala Badê ” têne naskirin. Nivîsên ku li ser kevirên pirê hatne nivsandin gelek in, û her desthilatdarî jî, kevirê nû ê ku navê siltanên wan li ser bûye, pê ve danîye. Mînak; Artûkîyan, Selçûkîyan û Osmanîyan û hwd.....

Di demên dawîn da, di dema serhildanê Sasûnê da, em vê jî baş dizanin ku, generalekî tirk bixwe jî, hin keviran deranîye, tine kirîye û hinekên wan jî, ji bo neyên xwendin xera kirye....



Ev agahî di pirtûka Hasan Hişyar da berfirehî hatne nivsandin. Ya din pirtûka hêja a Îbn-ul Erzak, agahîyên kêrhatî û berfireh dide me, nemaze di der barê Dewleta Merwanîyan da....

Lê mixabin, bi tenê beşeke biçûk a vê pirtûkê hatye wergerandin û beşên din jî li benda lêkolînê ne... Orîjînalê wê, di mûzeyê Londonê da ye û Abdullatîf Avad ê lêkolînerê ereb- Misrî, hin beşên wê ên din jî amade kirye û weşandye. Mamoste M. Emîn Bozarslan, beşa Merwanîyan ji erebî wergerandye li tirkî û bi navê ” Mervani Kürtleri Tarihi ” daye weşandinê...

Beşên din jî, li benda lêkolînê û wergerandinê ne... Bi hêvîya lêkolînê û wergerandinê wan beşên din jî....



Ji bo Zarokan Lîstîk

Nivîskar: Perwerdekar Adem GÜNEŞ Wergêr: Emre MÛHARGÎNÎ

Piraniyên dê û bavan, ji bo karên xwe yê rojan e bi hêsanî çareser bikin zarokê xwe handan(teşwîq) dikin ji bo leyîstikê; lê wate ya vî ji bo pirê zarokan qet ne berginda emrê "Hadê here bileyize" yê ye.

Lîstîk, lêhûrbûyînê(konsantre) dixwaze.

Lîstîk, ji bi yek bûna zarok û giyanê lîstîkê pêk tê.

Di lîstîkê de zarok cîhanek li gor xwe ava û xeyal dike.

Gerîdeya di destê wî/ê de, pêçkeyê(teker) biçûkê wê gerîde yê, rêwiyê ku hûn nabînin lê yê ku ew dibîne û bi wan re diaxife. Ji bo gerîdeya wî/ê rêyên taybet û li der û dora wê rêyê jî lembayê trafîqê, peyayê ku ji bo lembaya sor sekinîne û hwd. hene. Van hemû tiştan di cîhana zarokê de; di dema lîstîkê de mîna lehengê efsûnî yê ku dest bi tevgerê dikin in. Wekî rêwîtiyên ku Elî li nav eywanê bi gerîdeya xwe dike ne.



Xwepapo kirin an leyîstin?

Dê û bav bi gelemperî wekî ku bi zarokê xwe re dileyîzin didinê xuya kirinê. Hal we ye zarokê tiştê ku herî tehemûl nake, ew kesên ku bi wî/ê re nejidilî dileyîzin.

Zarok di nav pîvanê hêza xeyalê xwe de, herêma ku tê de lîstikê dileyîze bi tevahî kontrol dike. Di vê demê de tiştê di destê zarokê de bi tenê bûkek(pêlîstok) be jî, dêya wî/ê ku nayê xuya kirinê çûye marketê ji bo zarokên xwe şîr bikire. Dîsa ji bo wê zarokê nexweş ketiye bibe nexweşxaneyê bavê wî/ê li qûncekî sekiniye. Werhasil di dema lîstikê da hêza xeyalên zarokê bêtixûb dixebite.

Mirov van tevî nizanibe û têngihîje bixwaze bi zarokê re bileyîze ev ji bo zarokê ji pirsgirêk û pê hisandineke ne hêja ye û pêştir bi kêrî ti tiştêkî nayê. Her çiqasî dê û bav ji bo xwe bixapînin dibên: “Binêre ev saeteke ez bi te ra dileyîzim.” Jî ji bo zarokê ev ne leyîstik e ancax xwepapo kirin e.

Lîstika bi zarok re destbikêrî dixwaze

Ji hemû van rastiyan ku em derên rê em dikarin lîstikê wekî “Ketina cîhana xeyalî ya zarok û hev nasîna lehengê wî/ê yê nepenî, hînkirin û pejirandina rêzikê zarok yê di



cîhana wî/ê de” terîf bikin. Hekena rawestina li ba zarok û “dûût, dûût...” ajotina gerîdeyeka wî ya li ser masê, nayê wate ya lîstik leyîstin a bi zarokê re.

Şertê yekemîn û hîmî yê leyîstika lîstikan bi zaroka re; divê zarok di we da ew “qabiliyet” a ku hûn ê dikaribin lîstik bileyîzin bibîne û wê we bipejirîne cîhana xwe ya xeyalî. Lewre zarok hemû kesî napejirînin vê jiyana xwe ya taybet; ev dê û bavê wî bin jî.

Zarok desthilatdarê lîstoka ku dileyîzê ye

Her çiqasî hûn mafê ketina cîhana zarokê bi dest bixin, jî xala girîngiya leyîstina



lîstikana pê re hûn bin pê bikin; zarok tavilê wê we ji wê herêma taybeta cîhana xwe ya xeyalî biavêje derve. Xala girînga lîstikê ev rêzîk e: “Her zarok desthilatdarê lîstika xwe ye.” Dê û bavîtiya we di mal a we de muteber e. Di cîhana xeyalî ya zarokan de dê û bavîti betal e.

Ku hûn lîstika leyîstokan bi zarok re bipejirînin êdî hûn nikarin rêzîkekî nû daynin. Divê hûn li gor rêzîkê zarok tevbigerin. Wekî mînak; gava ku hûn gerîdeyê xwe li ser masê hêdî hêdî biajon û ku we dît zarok ji nişkave sekinî, ji bîr nekin ew gav lembaya sor vêketiye.

Zinhar nepirsin: “Ka lembaya sor li kuderê ye?” Lewre li hember vê pirsê wê zarok bikeve nav hêvîsestîbûneke mezin.

Lîstok bêmebest e

Çaxa ku zarok dest bi lîstikê dîke ne armancek wî heye û ne jî senaryo ka wî ya nivîsandî heye. Her tişt di bîskekî de diqewime. Ev rewş cîhana zaroka ya xeyalî bi zûbûnekî deresayî geşe dîke û ji alîkî ve jî zerengiya helkirina gelş û pîrsgirêka zarok zêde dîke.

Dema di lîstokê de zarok leqayî pîrsgirêkeka jêhêvînekirî bê; bi biryareka zêhn, zerengiya çareseriyê bi dest dixê. Wekî mînak ji ber ku zarok gerîdeyeka biçûk pîr zû diajo polîsê trafîqê wî disekinîne û jê wî dipirse; “ Çima tu hewqasî zû diajoyî?” her bersiva ku wê zarok bide, hêza ramanên wî yê dahûranî(analîtîk) zêde dikê.





BAWER AGIRÎ

ZIMAN Û JIYAN

Ziman, hêmana bingehîn a ragihandinê ye. Mirov bi rêya ziman fikir, hest û ramanên xwe tîne ziman û têtîliyan bi hev re datîne.

Ziman, hêmana bingehîn a ragihandinê ye. Mirov bi rêya ziman fikir, hest û ramanên xwe tîne ziman û têtîliyan bi hev re datîne. Ziman pira navbera paşeroj û pêşerojê ye. Bêyî ziman têtîliya mirovan ne mimkun e ku pêk were. Ziman ferdên civakê bi hev ve girê dide û di navberê de dibe navgîna sereke.

Ziman navgîna xwendin û nivîsandinê ye û bi axaftinê jî têtîliyeke xurt di navbera mirovan de çêdike. Ji ber vê yekê jî ziman amrazekî sereke yê di navbera jiyana mirovan de ye. Mirov bi saya ziman xwe îfade dike û hemû xewn û xeyal, daxwaz û xwestekên xwe pêk tîne. Mirov dikare bibêje ku firça di destê wênesaz de çî be, ziman jî ji bo mirovan ew e, risteyên helbestan ji bo stranên çî bin, ziman jî ji bo xwederbirîn û xweîfadekirina mirovan ew e.

Bi saya ziman helbest, roman û gelek mijarên din hatine nivîsandin û têne nivîsandin. Şano têne nivîsandin û lîstin. Mirov bi nivîsên wiha re bi pêş dîkeve û bextewar dibe, dibe xwedî agahî û zanîne.

Mirov bi xwendinê hînê babetên cuda dibe û derya zanîne kûrtir dike. Carinan dibe keştivan, carinan jî dibe geştîyar. Mirov di jiyana xwe ya rojane de stranên guhdarî dikin, helbest û nivîsan dixwînin. Bi wan re şa dibin, bi wan re xemgîn dibin. Ev gişk bi saya ziman pêk tê.

Mirov bi zimanekî xweşik hestên xwe tînin der. Em ji vê re dibêjin axaftina xweşik anku xweşaxaftin. Heke bi nivîskî be em jê re dibêjin wêjeya estetîk. Jixwe her gotineke xweşik wêje ye. Çi nivîs dibe bila bibe heke bi awayekî xweşik û estetîk hatibe nivîsandin ew wêje ye.

Zimanê bav û kalan ê kurdî ji me re gelek diyariyên hêja hiştine. Kilam, helbest, çîrok, destan, gotinên pêşîyan, biwêj, mamik û gelek mijarên din ên ku em niha pê dizanin.

Mirov bi ziman hunera xweşaxaftinê pêş xistiye. Zimanê helbestê awayê xweşaxaftinê ye, stran û gotinên ku têkiliyên mirovan xurt dikin jî xweşaxaftin e. Ziman ne amûrekî ji rêzê ye, lê divê amûrekî rêz jê re were dîtinê ye.

Di demên berê de mirovan nekarîbûne biaxivin. Bi hereketên destên xwe xwestine hin tiştan bibêjin. Lê ev bi qasî axaftinê ne bi bandor bûye. Mirovan bi demê re deng derxistine. Dûre wate dane wan dangan. Piştî demekê ew deng bûne kîte, dûre bûne peyv û dûre re jî bi wan peyvên hevok saz kirine. Ev yek di demeke dirêj de pêk hatiye.

Di roja me ya îro de hê jî tê dîtin ku hereketên dest û serî tînin bikaranîn. Mesela, em gelek caran şûna ku bibêjin erê, em serê xwe berjêr dikin, şûna ku em bibêjin na, em serê xwe hevraz dikin.

Em carinan bêyî axaftinê bi dest û serî hin tiştan erê dikin an jî hin tiştan red dikin. Em bi çav û mîmîkên xwe jî, bi liv û tevgerên xwe jî dikarin hin mesajên bidin. Ji vê re zimanê bedenê anku zimanê laş tê gotin. Mirov gelek caran bêyî axaftinê bi zimanê bedenê jî dikare hin mesajên bide. Divê em bi bîr bixin ku bav û kalên me ev mîrateya giranbiha hîç bi hêsaniyê negihandine roja me ya îro. Zimanê bav û kalan ê kurdî ji me re gelek diyariyên hêja hiştine. Kilam, helbest, çîrok, destan, gotinên pêşîyan, biwêj, mamik û gelek mijarên din ên ku em niha pê dizanin. Ziman di nava demê de her tim xwe nû kiriye û xwe dewlemend kiriye. Ta ku gihiştîye roja me ya îro. Zimanê kurdî ji malbata Hînd-Ewropayê ye û li ser erdnîgariyê fireh ji aliyê bi milyonan kesan ve tê axaftin û di nava bi dehan zimanên zindî yê karîger de cihê xwe digire.

Zimanê Kurdî

(Helbest)

MUSTAFA ACAR

“

*Sekir û qend e
Hemîn û bend e
Ruh e di ten de
Zimanê Kurdî*

”

Şekir û qend e
Hemîn û bend e
Ruh e di ten de
Zimanê Kurdî

Bo me ew can e
Xwarin û dan e
Ew av û nan e
Zimanê Kurdî

Ji me-r xîret e
We'z û şîret e
Rê û sîret e
Zimanê Kurdî

Ew ol û dîn e
Heyat û jîn e
Evîn û Zîn e
Zimanê Kurdî

Stêrk û hîv e
Bihîşt û nîv e
Ew zêr û zîv e
Zimanê Kurdî

Wehî'w ayet e
Her ew xayet e
Qesd û nîyet e
Zimanê Kurdî

Şohret û şan e
'Eşqa başan e
Aş a êşan e
Zimanê Kurdî

Li dinyê tek e
Bo me ew çek e
Xwişk e û kek e
Zimanê Kurdî


Dayik û bav e
Ronî û tav e
Ji me re çav e
Zimanê Kurdî

Yê nezan hov e
Heqê wî gov e
Ji me re tov e
Zimanê Kurdî

Zarokno eman
Hîn bibin ziman
Her dem û zeman
Zimanê Kurdî

Zimanê Xanî
Ew mêrg û kanî
Tu xweş bizanî
Zimanê Kurdî

Helbesta Mela	Zimanê pîroz	Stran û helbest
Ala li kela	Ew e bo me doz	Raman û her hest
Dûr dike j' bela	Bi sond û bi soz	Her ew e mebest
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî
Dengê feqî ye	Bo me şînok e	Reqs û govend e
Rastî'w heqî ye	Rastî'w çîrok e	Kêfa di ken de
Ew ne şeqî ye	Çand û dîrok e	Bo wî ez bende
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî
Fexra Kawa ye	Bo me heval e	Bo me ew Mem e
Rewşa lawa ye	Keskesor al e	Çiya û çem e
Çi xweş hawa ye	Ne qîl û qal e	Kulîlk û lem e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî
Dûrika bûkan	Xemla qîzan e	Şîrê helal e
Nexşeya sûkan	Qina gwîzan e	Ava zelal e
Hîn bibe zûkan	Kurd wî dizane	Çiqas delal e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî
Lorîna dayê	'Îd e û cejn e	Kulîlk û gul e
Bê wî hewn nayê	Wêje berbejn e	Gurçik û dil e
Xweşsura bayê	Bi wê xweş bejn e	Bo neyar kul e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî
Rûmeta bavê	Ew e çek û rext	Dinya tarî ye
Kemer e l'navê	Pê xweş dibe bext	Bê wî arî ye
Her wext û gavê	Serok e l'ser text	Şaxek Arî ye
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî



Bîstan û bax e	Her dem zindî ye	Rengareng lewn e
To û qîmax e	Rind û cindî ye	Rastî û xewn e
Bo dijmin dax e	Şarî'w gundî ye	Herî xweş hewn e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî

Bawerî'w bîr e	Peyvek şêrîn e
Siltan û mîr e	Şorek zêrîn e	
Bo neyar tîr e	Çi xweş qêrîn e	
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî	

Çi xweş buhişt e	Ew miqedes e
Ji me'r nivîşt e	Ji me re bes e
Bo me her tişt e	Bo dil qefes e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî

Şêrîn lîsan e	Bi xêr û bêr e
Herî hêsan e	Tije û têr e
Kula pîsan e	Wek dur û zêr e
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî



Dijmin neyar e	Tahma sêvê ye
Ji me re har e	Şewqa hîvê ye
Ji me re yar e	Neqşa lêvê ye
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî

Gul û şîlan e	Meyweyên darê
Reqs û dîlan e	Rengên biharê
Êşa Zîlan e	Ji wî tîn xwarê
Zimanê Kurdî	Zimanê Kurdî




**NIVÎSKAR
MUHAMMED BÊCIRM**

Du e-pirtûkên nû
ji Weşanxaneyê
Çandnameyê
derketin



DERKET!







GOTINÊN PÊŞIYAN
ABDURRAHMAN AYDOĞDU

ÇAPA
3.

Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bînê ba hev, bingehêke sazîtiyê bide kovageriya kurdî, kovageriya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.

Kovarên Endam



[/KovargerenKurd](#)

KovargerenKurd@gmail.com

ÇANDNAME

Endama Koma Kovargerên Kurd e